Pirsgirêkên Hişê Erebî

Rozad Elî

Yeke ji sinc û vewîniyên “ramana tevayî”, dihêle yên din weke wî biramin, kar û xebatên xwe, li gor bername û pirojeyên wê,bi rê ve bibin; ango weke “Birokrost” textekî wan î pîvanê heye.Grke tu li gor wî textî bî, çi dirêjbûn an kinbûna bejna te ji ewî textî, dê bihêle seriyê te jê bibe yan jî tu bête vezîlandin. Daku, tu li gor pîvan û xwestekên xwedî "ramanên tevayî” bî.

Helbet ev hizir û ramyarî ne tenê rojhilatî ye, weke ji rûpelên dîrokê tê zanîn, miletên Ewropî bi xwe jî ne dûrî evê ton ramyariyê bûn; şerên ku di navbera Pirotistant û Kasolîkan de rabibû nimûneyeke balkêş e di vî warî de; di rojekê de nêzîkî (100) sed hezar “bawermend” ji hev kuşt. Lê şerê cîhanê yê duyem, yê ku li hember ramyariya Nazî lidarket hêşt, ku ev ton fikir li welatên Ewropî ku bibe, piştgirên wê newêribin xwe aşkere bikin; heya roja îro nîşana Naziyan qedexe ye û mirov li ser hildana ewê nîşanê tê dadgehkirin.

Lê eger em vegerin rewş û çanda rojhilatî, emê bibînin ku, ew raman ne tenê bûye weke sinc û vewîniyeke me, xwe berdaye tamaran û bûye parek ji netêgihiştina me ya tevayî. Lê ewê ramyariyê hêştiye ku ew bibe yek ji kar û barên me yên rojane û em ewan kesên xwediyên hizrên yek bawerî, ji xwe re bikin simbol û serok jî.

Çavkaniyên sereke, ji ramana tevayî re li Rojhilta Navîn, didu ne: Ramana hişkbawer ya oldarên Îslamî, û ramana netewî ya netewperestên Ereb. Em dikarin bibêjin, ku mêjiyê wan Mislimanan, bi tevayî û wan Ereban bi taybetî di kirîzeke tûj re derbas dibe û du rê li pêşiya wan in; yan divê xwe ji pîroziya hizir û deqên olî yên kevin û dirûşmên nijadperestiya netewî rizgar bikin û bi rastî derbasî sedsaliya bîst û yekan bibin û mêjî û zanyariyê ji xwe re weke pîvan bipejirîne, yan jî ewê çend salekî di evê rewşa terorîzmî ya xirab de bimîne û li dawiyê dê tenê seriyê xwe jê bikin, gava ku ji bilî wan ti kesî din li ser evê xakê nemînin; gelên din dê tev li asûmanan bijîn.

Belkî em hinekî, ji mijara xwe bi dûrketibin. Lê dîsan jî, ew di ewê çarçewê de digere. Me got ku, ji xasmayên ramyariya tevayî ye, ew dihêle tu bi zorê, weke wî li tiştan binirî û bibînî, ji ber ku, di bîr û baweriyên xwediyên evê ramyariyê de, ew tenê rastiyê dinasin û ewên din hemû li ser çewtiyê ne. Di evê koşeyê re em dikarin têbighên, ku çima rewşenbîrê Ereb û ne tenê siyasetvanê wan ji mirovê Kurd dixweze, ku weke wî birame û helwestên wan bigre.

Di derheqa eva yekê de, nemaze li evê dawiyê, me gelek deng bihîstin, qîreqîra wan bilind bûye û bang li kolanên Erebî dikin, ku hajî Kurdan û anîna ji Israîliyan re bo başûrî Kurdistanê hebin. Ev ton bang ji aliyê

→